

HÜSEYİN-İ KÜRD METNİNİN EDEBİ TÜRÜ, MOTİF YAPISI VE ONUN KURMANCİ SÖZLÜ HALK EDEBİYATINDAKİ YERİ

THE LITERARY GENRE OF HUSSEİN-İ KURD TEXT, MOTIF STRUCTURE AND ITS
PLACE IN KURMANJİ ORAL FOLK LITERATURE

CUREYÊ EDEBÎ YÊ METNA HUSEYNÊ KURD, BINYADA MOTÎFÊN WÊ Û CÎHÊ WÊ DÎ
EDEBÎYATA GEL A KURMANCÎ DA

Ayhan YILDIZ*

Öz

Huseynê Kurdîşah adlı metnin Kürtçe bir varyantını yıllar önce derlemiştik. Daha sonra Huseynê Kurdê Şebisterî adında bir Farsça metni gördük. Arama sürecinde, bu eserin Youtub üzerinde birkaç videosunu da gördük. Bu arada birkaç araştırmacı, bu metnin Kurmanci birkaç varyantını derleyip kitap olarak bastırdı. Böylece bir alanyazını oluşturdu. Alanla ilgili arama yaptığımızda, araştırmacıların bu metinle ilgili birkaç Farsça ve İngilizce makaleyi yayımladıklarını, ancak onların bu çalışmalarında bu eserin Kurmanci olan varyantlarından hiç bahsetmediklerini farkettilik. Bunun yanısıra onlardan bazıları bu eserin edebi türünü destan, bazıları kıssa, bazıları halk masalı ve bazıları da halk hikayesi olarak belirlemişlerdi. Eserin bu yönünde de bir karışıklık vardı ve biz bu durumu araştırmamızın sorunu olarak belirledik. Çalışmamızın sorun ve sorularını belirledikten sonra, onun coğrafik sınırlarını da Türkiye'nin sınırları içinde bulunan Doğu bölgesindeki Kurmanci konuşucularıyla sınırlandırdık ve verilerimizi toplamaya başladık. Araştırma süreci sonunda, bu eserin 5 metninin Muş, Batman, Diyarbakır ve Adıyaman taraflarından derlendiği ortaya çıktı. Bu varyantların Kurmanci metinlerinin kendi aralarında ortak, benzer ve farklı yönlerinin olduğu gibi, Farsça metinlerle da bu yönlerinin olduğunun da farkettilik. Alanyazını okuyup değerlendirdikten sonra bu metnin edebi türünün İslami kahramanlık halk hikâyesi olduğu kanaetine vardık. Eserdeki olayların 17. yüzyılda meydana geldikleri ve bu metnin 17. yüzyıldan sonra Kurmanci halk edebiyatına girmiş olabileceği sonucuna vardık.

Anahtar kelimeler: Kürt Halk Edebiyatı, Halk Hikayeleri, Dini Kahramanlık Halk Hikayeleri, Kürt Halk Hikayeleri, Huseynê Kurd.

Abstract

We had compiled a Kurdish variant of the text called Huseynê Kurdîşah years ago. Later, we saw a Persian text called Huseynê Kurdê Şebisterî. During the search process, we also saw a few videos of this work on YouTube. In the meantime, a few researchers compiled several Kurmanji variants of this text and published them as books. Thus, a body of literature was formed. When we searched the field, we noticed that researchers had published several Persian and English articles about this text, but they did not mention the Kurmanji variants of this work in their studies. In addition, some of them determined the literary genre of this work as an epic, some as a short story, some as a folk tale, and some as a folk story. There was also confusion in this aspect of the work, and we identified this as the problem of our research. After determining the problems and questions of our study, we limited its

* Dr. Öğr. Gör. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, E-posta: ayhanyildiz@artuklu.edu.tr ORCID: 0000-0002-8763-4182

geographical boundaries to Kurmanji speakers in the Eastern region within the borders of Turkey and started to collect our data. At the end of the research process, it was revealed that the 5 texts of this work were compiled in Muş, Batman, Diyarbakır and Adıyaman. We realized that the Kurmanji texts of these variants have common, similar and different aspects among themselves, and that they also have these aspects with Persian texts. After reading and evaluating the literature, we came to the conclusion that the literary genre of this text is an Islamic heroic folk story. We concluded that the events in the work occurred in the 17th centuries and that this text may have entered the Kurmanji folk literature works after the 17th century.

Keywords: Oral folk literature, Folk tales, Religious Heroic Tales, Kurdish Folk Tale, Huseynê Kurd

Kurte

Me varyanteke Kurmancî ya metna Huseynê Kurdîşah, berî çend salakî berhev kiribû. Peyra me bi navê Huseynê Kurdê Şebisterî metneke bi zimanê Farsî dît. Di pêvajoya lêgerînê da em rastî çend vîdeoyên vê berhemê yên bi Kurmancî hatin ku li ser Youtubê hatine weşandin. Di vê navberê da çend vekoleran hinek varyantên din ên Kurmancî jî berhev kirin û wekî pirtûk çap kirin. Bi vî awayî lîteratureke vê qadê çê bû. Piştî ku me di qadê da geryanek kir, me pê derxist ku çend vekoleran hin gotar bi zimanê Farsî û Îngilîzî weşandine; lêbelê wan di van xebatên xwe da qet behsa varyantên Kurmancî yên vê berhemê nekirîye. Herwiha hinekan ji wan, cureyê edebî yê vê berhemê wekî destan, hinekan wekî qisse, hinekan wekî çîroka gel û hinekan jî wekî hîkayeya gel bi nav kiribû. Di vê hêla berhemê da jî tevlihevî hebû û me ev rewş, wekî problema vekolîna xwe li qelem da. Piştî ku me pirs û pirsgerêka vekolîna xwe dîyar kir, me tixûbên xebatê jî bi cografyaya axiverên Kurmancî yên herêma Rojhilat ku di nav tixûbdên Tirkîyeyê da dimîne sînordar kir û dest bi berhevkirina daneyan kir. Di dawîya pêvajoya vekolînê da derket meydanê ku 5 metnên vê berhemê ji hêla Muş, Batman, Diyarbakir û Semsûrê hatine berhevkirin. Em pê hisiyan çawa ku alîyên van metnên Kurmancî yên hevpar, dirûvdar û cîyawaz hene, ev alîyên wan ligel metnên varyantên wan ên Farsî jî hene. Di pey xwendin û nirxandina giştî ya lîteratura vê qadê da qenact bi me ra çê bû ku cureyê edebî yê metna vê berhemê “hîkayeya gel a qehremanî ya Îslamî” ye. Em gihaştin wê encamê ku rûdanên vê berhemê di sedsala 17an da qewimîne û ev metn ji sedsala 17an bi şûn da ketîye nav berhemên edebîyata gel a Kurmancî.

Bêjeyên Sereke: Edebîyata gel a devkî, Hîkayeyên gel, Hîkayeyên qaremanî yên dînî, Hîkayeya gel a Kurdî, Huseynê Kurd.

DESTPÊK

Di sala 1998an da me versîyoneke Huseynê Kurd ji devê çîrokbêjekî Serhedî berhev kiribû. Wî bi şexsê xwe ji vê hîkayeyê ra digot çîroka Huseynê Kurdîşah. Ev metin wisa ma heta sala 2018an. Peyra me hin pdfyên metnên çapkirî yên bi zimanê Farisî bi navê “Huseynê Kurd ê Şebisterî” li ser Googlê dîtin. Piştî ku me ev metin xwendin, me dît ku ew jî di dirûvê vê hîkayeyê da ne. Peyra me rêzevîdeoyên bi navê “Hiseynê Kurd, Qudbedînê Farqînî” li ser Youtubê dîtin. Vî hîkayebêjî bi awayekî dirêj ev hîkaye derdibirî. Di pey van da me xebatên Hîlmî Akyol jî dîtin. Wî jî sê varyantên vê metnê berhev kiribûn û ew çap kiribûn. Di temamê van varyantan da navê hevpar ê berhemê Huseynê Kurd bû. Ji ber ku bi vî navî metneke edebîyata gel a Kurdî hebû, bivê nevê ji bo edebîyata gel a Kurmancî “giring” bû û hêjayî vekolînê bû. Li ser van geşedanan, me dest pê kir em lê gerîyan, me çend varyantên din jî dîtin û ew rêz kirin. Li ser vê yekê me geryanek li ser lîteratura xebatên ku têkildarî van berheman bûn kir û di encama vê lêgerînê da me dît ku bi zimanê Îngîlîzî û Farisî li ser metnên Farisî yên vê hîkayeyê gotarên akademîk hatine weşandin; bes tu xebateke bi zimanê Tirkî û Kurmancî li ser metnên vê hîkayeyê nehatine weşandin. Lewra me ev rewş wekî kêmasîyekê hesiband, ji bo vekolîna xwe kir “hincet” û dest bi vê xebatê kir.

Piştî ku me hinceta xebatê dîyar kir, dor hat ser “pirsgirêk”a vekolînê. Tevî ku li ber destê me nêzî çar varyantên berhevkirî û çapkirî yên metna “Huseynê Kurdîşah” hebûn û me di geryana lîteraturê da tu xebateke vekolînî bi Kurmancî li ser vê nedît. Lewra me mereq kir bê ka “gelo li gor dîsîplîn û zanista folklorê em dê cihê edebî yê vê metna devkî, di nerîta edebîyata gel a Kurmancî da çawa tesbît bikin?” Çinku gava me ev lîteratur xwend, me dît ku hin vekoleran versîyona wê ya bi zimanê Farisî ya bi navê Huseynê Kurdê Şebisterî, wekî “destan” bi nav kirîye; hinekan ew wekî “hîkayeya gel” hesibandîye û hin vekoleran navê “çîrok”ê lê danîye. Ev jî wekî problemek bû li pêşberî me. Lewra ji bo ku em vê pirsgirêkê vebersivênin, me ev pirsên jêrîn wekî “eger”a vekolînê dîyar kirin: 1. Gelo li kîjan herêmên axiverên Kurmancî yên di nav tixûbên Tirkîyeyê da ev hîkaye dihê derbirîn? 2. Gelo cureyê edebî yê vê metna devkî çi ye? 3. Gelo di nav metnên devkî da ya herî bitertîb û tekûz kîjan e? 4. Gelo ev berhem kîjan sedsalê hatîye hûnandin? 5. Memleketê Huseynê Kurd kû der e? 6. Gelo binyada motîfên di vê metnê da çawa ye?

Bi armanca ku em cihê edebî yê metna Huseynê Kurdîşah li gor dîsîplîna folklorê di nav metnên edebî yên edebîyata gel a Kurmancî da tesbît bikin, me dest bi berhevkirina daneyan kir. Mebesta vê vekolînê jî ew e ku kêmasîya ku di vê qadê da heye, li gor derfetên xwe tekûz bike, alîyên wê yên îhmalkirî derxîne meydanê û rê li ber vekolînên nû veke.

Me di vê vekolînê da cografyaya axiverên Kurmancî yê ku di nav tixûbên cografî yê Tirkîyeyê da dimêne, wekî unîverseya (çalışma evreni) xebatê dîyar kir û me metnên Huseynê Kurdîşah ên bi Kurmancî yê devkî, wekî daneyên eslî ji vê populasyonê berhev kirin. Çi yê devkî bin çi jî yê ku ji alîyê berhevkarên ve hatine berhevkirin û çapkirin bin, di xebatê da me ew rêz kirin û taybetmendiyên wan ên teşeyî û kurteyî dîyar kirin. Peyra me ew xebatên akademîk ku ji alîyê vekoleran ve bi zimanê Farisî û Îngilîzî li ser metna Farisî ya çapkirî ya Huseynê Kurdî Şebisterî hatine kirin, ji lîteraturê tesbît kirin¹ û xwe gihand encamên wan. Piştî ku me cih da şayesandina daneyan, me li gor metoda kalîtatîf analîz û şiroveya daneyan kir û encama vekolînê dîyar kir.

Ji bo ku em hîn maqûltir pirsgerêka vekolînê çareser bikin, pirsên xwe yê vekolînê vebersivênin û xwe bigihênin armanc û meqseda vekolînê, pêdivîya me bi xwendin û nirxandina lîtaratura têkildarî metnê hebû. Lewra me li gor tarîxa wan a xebatê, ev vekolînên ku bi destê me ketin, ligel nirxandina wan li jêrê rêz kirin:

Ulrich Marzolph (1999) bi xebata xwe ya bi navê “A Treasury Formulaic Narrative: The Persian Popular Romance Hosein-e Kord [Vegêrana Formuleke Xezîneyî: Romantizma Populer a Persî Huseyn-i Kord] (Marzolph, 1999, r.72) derketîye pêş. Ew bi taybetî li ser alîyê populer ê vegêrana Farisî ya di vê hîkayeyê da kûr bûye. Wî alîyên dirûvdar ên bi destana neteweyî ya Îranê “Şahname”yê ra berawird kirine û nerîta vegêrana devkî ya Farisî derxistîye pêş.

Rosemary Stanfield Johnson (2004) gotareke bi navê “The Hayderabad Connection in the Hoseyn-e Kord” [Peywendîya Heyderabadê ligel Huseynê Kurd] (Johnson, 2007, r.73-74) weşandîye û navê Hoseyn-e Kord Shabestari lê danîye.

E. Polat (2005) metneke Huseynê Kurd bi navê “Qemer Hesên û Kurê Wî Hisênê Kurd” di nav pirtûka xwe ya *Şorbe û Fedî Xela û Xeyîdî* da bi cih kirîye.

Herwiha Rosemary xebateke din a bi navê bi xebata xwe ya “Yuzbashi-yi Kurd Bacheh and ‘Abd al-Mu’min Khan the Uzbek: A Tale of Revenge in the Dastan of Husayn-i Kurd,” [Yuzbaşîyê Kurd û Ebdulmu’min Xanê Ozbek: Hîkayeya Tolhildanekê ji Destana Huseynê Kurd] (Johnson, 2007, r.165-169) ketîye nav vê lîtaraturê. Vê vekolerê, ew destnivîsa herî kevnar a vê hîkayeyê ku di nav gel da berbelav e bi dest xistîye û li serê xebitîye. Navê wê metnê, “Huseyîname” ye û dîroka li serê jî 1839-40 e. Ev destnivîsa navbihurî, li Moskovayê, di Akademîya Rûs a Zanistan a Enstîtuya Zimanên Asyayê da dihê parastin.

¹ Mamoste Dr. Shahab Vali di vê mijarê da alîkarî kir. Em minetdarê wî ne, mala wî ava be.

Vahe Boyajian-Surenians xebateke bi navê “A Baluchi Episode From the Huseyn- Kord-e Shabestari Cyle”, (Boyajian-Surenians, 2007, 249) [Epîzotek Belûcî ji vegêrana Huseynê Kurdê Şebisterî] kirîye û peywendîya vê hîkayeyê bi gelê Belûcî ra danîye.

A. Yıldız (2017) di pirtûka xwe ya *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî 1* da cih daye hin agadarîyên têkildarî metna Huseynê Kurdîşah a folklorîk û ew wekî “destan bi nav kirîye.

H. Akyol di pirtûka xwe ya bi navê Huseynê Kurdî da cih daye du varyantên vê metnê (Akyol, 2018, r.32). Metna herî dirêj e ku di vê pirtûkê da cih girtîye.

Emir Abbas Azizifer, (2019) vekolîneke bi navê Cestarî der Tîpşahan-i Şînasî der Farsî ‘Amiyane-ihay Qisse: Mewrid-i Pijuhane: Semk-i ‘Eyar, Darabname ve Qissa-i Hüseyin Kurd Şebisteri (Azzizifer, 1398, r.25) [Vekolînek li ser Cureyê Şahanolojî yê Çîrokên Gel ên Farsî] kirîye û ew li ser alîyên folklorîk kûr bûye.

Huseyin Beyat & Mahbube Hayderi & Şehnaz Rehimi Ferd (2020) bi navê “Tahlil-i Guftman Întikadi der Dasitan-i ‘Amiyane-i Hüseyin Kurd Şebisteri”, [Analîza Dîkursî ya Rexnegirane ya Destana Huseynê Kurdîşah] xebatek pêk anîye. Van vekoleran di vê xebata xwe da giranî daye ser alîyê dîkursî yê vê hîkayeyê û ew gihaştine wê encamê ku hîkayebêjan, di vegêranên xwe da Huseynê Kurd, hin caran ji hêla pile û payeyê ve raserî Şahê Îranê dîtîye.

Mehran Afshari (2021) di xebata xwe ya “Stories and Tales Entertainment as Litarature” da cihekî taybet bi navê “Qesse-ye Hoseyne- Kord-e Shabestari or Hoseyn-nâme” daye metna vê hîkayeyê. Vekoler dîyar dike ku ev rûdan di serdema Şahê Sefewî Şah Abbas (1588-1628) da qewimîye. Li gor vekoler, du metn li ser vê hîkayeyê hene. Yek jê bi navê *Qiseya Huseynê Kurd ê Şebisterî – Huseyn-name* ye, ya din jî bi navê *Huseynê Kurdê Şebisterî yê yetîm – Yetîmname* ye. Huseyn, di metna pêşî da yekî gundî û şivan e, hatîye cem Mesîh Tokme-bendê Tebrîzî ku palewanekî herî mezin ê Îranê ye û hînî palewanîyê bûye. Di metna duyem da Huseyn, li hember Şah Cîhanê Ozbekî derketîye.

H. Akyol (2021) di pirtûka xwe ya bi navê *Dengbêj û Çîrokbêjên Xerzan* da cih daye varyanteke vê metnê.

Mehmet Öncü di pirtûka xwe ya *Çîrokên Efsaneyî yên Kurdî* da cih daye varyanteke Huseynê Kurd (Öncü, 2022, r.406).

Parvin Torkamany Azar & Zeynab Eyvazi (2022) meqaleyeke Farisî bi navê

بازنمای داعیه‌ی سیاسی مذهبی و فرهنگی حاکمیت صافیان در داستان عامیانه حسین کرد شبستری

“Bazinmayî Daîyehay Siyasî, Mezhebî û Ferhengî Hakimiyet-i Sefewiyan der Dastan-i ‘Amiyane-i Huseyn Kurd Şebisterî [Temsîla İddîayên Sîyasî, Dînî û Kulturî yên Birêveberîya Safewî di Hikayeya Gel a Huseynê Kurd ê Şebisterî da]” weşandîye û wan alîyên dînî, sîyasî, dîrokî, nasnameya neteweyî û kulturî yên vê hîkayeyê derxistine pêş. Ev vekoler bi awayekî taybet, li ser wê têkoşîna berevaniya welatê Îranê ya li dijberî Ozbek, Hind û Osmanîyan ku di serdema Şah Ebbas da pêk hatîye kûr bûne. Wan ev hîkaye, wekî vegêraneke pevxistînî-hûnandî bi nav kirîye ku ji bo berevaniya welatê Îranê û hessasiyetên Şîitîyê hatîye çekirin. Ev jî nîşaneyê wê yekê ye wan vegêrên vê hîkayeyê, xwestîye zihna raya giştî ya Îranîyan bi parastina dîn û nasnameyê zindî bikin.

Muhemmed Ali Ateşewda (1384) gotareke bi navê “Ber Ress-i Saxt-i Dastan-ı ‘Amiyane-i Huseyn-i Kurd-i Şebisterî” (Ateşewda, 1384, r.84) [Analîza Danerîya Destana gel a Huseynê Kurdê Şebisterî] weşandîye û wî ev metin ji alîyê hêmanên pevxistinê ve analîz kirîye. Li gor wî ev metin, qehremanîyên Huseynê Kurd ên serdema Safewîyan derdibire. Vekoler, li ser alîyên hêmanên hîkayeyê yên mîna tema, hûnana rêzerûdanan, karakter, teswîr, dîyalog, awayê çavênêrî û şewazê kûr bûye.

Zehra Dehqan Dihnewi & Yedullah Celali Penderi (1390) gotareke bi navê

بر رس عنصر روایة در قصهٔ حسین کرد شبستری “Ber Ressi Unsur-i Riwayat der Qisse-i Huseyn Kurd-i Şebisterî [Vekolîna Hin Hêmanên Vegêranê di Hikayeya Huseynê Kurdê Şebisterî da]” weşandîye û li ser alîyên wê yên vegêranê kûr bûne.

Necme Hüseyini Sirûri (1399) gotareke bi zimanê Farisî ya bi navê “Zeval-i Şahsiyet-i Ayyar der Dastan-i Huseyin Kurd Şebisteri” (Siruri, 1399, r.137) [Ketina Eyar di Çîroka Huseynê Kurdê Şebisterî da] nivîsîye. Vî vekolerî piştî ku ev metin bi metoda şayesî-analîtîk vekolaye, gihaştîye wê qenaetê ku Huseynê Kurd lehengekî hîkayeyên gel ön mîna Hemze Nameh û Samak Ayyar e. Çi heye ku karakterê wî ne mîna yê wan lehengên berê ye, ew ji hêla zerîfîyê ve gelek li paş e. Bi tevî ku lehengên berê, zana, zimanşîrîn û zekî ne, Huseynê Kurd xwedî tîpeke eletewşî ye.

Wekî din di malpera bi navê <https://www.ketabrah.ir/%> da [Qisseyaya sewtî Qise Huseynê Kurdê Şebisterî] awayê bideng ê vê pirtûkê heye.

Çawa ku ji xwendina lîteraturê dîyar dibe, xebateke ku peywendîya wê rasterast bi mijara me ra hebe bi destê me neket. Xebatên ku hatine kirin, tenê li ser metnên çapkirî yên bi zimanê Farisî yên Huseynê Kurd in. Wisa xuya ye ku heta niha vekoleran li ser metnên Huseynê Kurd ê bi Kurmancî yên qada edebîyata gel, ne bi zimanê Tirkî vekolînek kirîye ne bi zimanê Kurdî.

Tenê hin kesan metnên wê ji nav gel berhev kirine û çap kirine. Lewra qenaeta me hasil bû ku bi rastî jî di vê biwarê da valahîyek heye û hêja ye ku em li serê vekolîn bikin.

Em dê serê pêşî varyantên ber destê xwe bidin naskirin peyra li ber ronahîya çavkanîyên edebîyata gel em dê li ser wan analîz bikin.

1. Varyantên Huseynê Kurd ên bi Kurmancî

Me varyantên Kurmancî yên metna Huseynê Kurd bi awayê çapkirî û yên neçapkirî polîn kirin, peyra jî ew li gor herêmên Kurmancîaxiv ên herêma nav tixûbên Tirkîyeyê rêz kirin:

1.1. Varyantên devkî yên neçapkirî

1.1.1. Varyanta Serhedê

A. Yıldız sala 1998an li Bursayê ji devê Heyderê Mûşî ev varyanta Huseynê Kurd berhev kirîye û bi awayê nivîskî li cem xwe parastîye. Wî di xebata xwe ya bi navê *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî 1ê* da cih daye agadarîyên wê.

Kurteya wê: Huseyn keça mamê xwe dixwaze, mamê wî wekî merc datêne ber wî ku 7 salan şivantîya peze wî bike. Huseyn piştî 7 salên şivantîyê, bi îzna mamê xwe çend mihan ji bo mesrefa dawetê dibe Misirê. Li wê derê ew û heywankiroxan li hev didin û asayîşa bajêr wî digire dibe dixe zindanê. Li vî bajarî Mesîh Palewan heye, ew bi vê rûdanê dihise û diçe Huseynî dibîne, pê ra diaxive û wî îqna dike ku bikeve nav palewênên wî. Huseyn li cem wî dest bi perwerdeya palewanîyê dike. Rojekê palewanekî nemuslim ê Îranî tê Misirê, pêkolî li dijberî palewanên muslim dike. Mesîh Palewean Huseyn derdixe pêşberî wî û dikevin şerî. Huseyn wî têk dibe. Li ser vê yekê Mesîh Palewan diçe bajarê Besrayê ku vê mizgînê bide Qudum Şah. Ku Huseyn tenê li Misirê dimêne, hinek derdorên palewanan jê çavreşî dikin û dek û dolaban li serê wî digêrînin. Ew jî hêrs dibe, li wan dide û terka bajarê wan dide, berê xwe dide Besrayê. Di rê da ew û Mesîh Palewan rastî hev tên, ew rewşa xwe jê ra dibêje û êdî ligel hev vedigerin Besrayê. Li wê derê piştî hurmet û zîyafetê, Huseyn ligel sazband Budo, şevekê ji heddê xwe derdikeve, navbera wî û Qudum Şah xerab dibe, lewra ji wê derê derdikeve, diçe li bajêr li cihekî dixebite. Piştî çendakî careke din ji Îranê palewanekî zerp tê Besrayê û meydan ji palewanan dixwaze. Kesek tune ku derkeve pêşberî wî, Huseyn derdikeve pêş û wî jî têk dibe. Piştra Huseyn dibêje îca ez dê biçim Îranê û derkevim pêşberî hemû palewanên wan. Mesîh Palewan jî ligel çend palewanên xwe pê ra diçe. Li Îranê Huseyn palewanên wan gişt têk dibe, xelkê Îranê dixe bin banê Îslamê, peyra jî dibe şahê Îranê û daweta xwe dike.

1.2. Varyantên devkî yên çapkirî

1.2.1. Varyanta Huseynê Kurd a herêma Diyarbekirê-Farqînê

Vegêrê vê varyantê Qutbedinê Farqînî ye. Ew sala 1952yan gundê Başkoy a Farqînê hatîye dunyayê. Mamosteyên wî Brahîmê Fatimê, Cemîlê Şer û Mihemed Salihê Beynatî ye. H. Akyol ev berhem di pirtûka bi navê *Huseynê Kurdî* da belav kirîye.

Kurteya wê: Huseyîn, lawê xuyanîyekî palewan ê bajarê Şeveserê yê bi navê Qere Hesên e, navê dêya wî Sîyahpoş e û ew jî palewaneke bajarê Tebrîzê ye. Bavê Huseyn dimire û ew êtîm dimîne, dayîka wî, wî dide ber xwendina medreseyê. Di vê navberê da Huseyn dibe evîndarê keça mezinekî Şeveserê û ji bo zewaca pê ra 7 salan şivantîya bavê wê dike. Piştra bavê keçikê wî dişêne Tebrîzê cem Mesîh Palewan da ku jê xelas bibe. Mesîh Palewan gava Huseyn nas dike, rast nabîne ku wî bikuje û wî di kursa palewanîyê da perwerde dike. Piştî çendakî palewanekî nemuslim tê Tebrîzê û ew, Mesîh Palewanê ku zîlamê Şah Ebbas e, di şerî da perîşan dike. Huseyn pir bi ber wî dikeve û tola wî hiltîne. Bi vî awayî ew jî li Tebrîzê nav û deng dide. M. Palewan diçe Îsfahanê û Huseynî li Tebrîzê dihêle, lêbelê Huseyn jî bi awayekî xefî berê xwe dide Tebrîzê û diçe wê derê, li dijberî palewanên nemuslim dikeve şeran. Di wan rojan da ew ji ber dilsafîya xwe dikeve nav tengasîyan, M. Palewan tê ra derdikeve û wî xelas dike. Êdî Huseyn, ji bo ku Hindistanê jî fetih bike derdikeve rê. Di vê rêwîtiya wî da li dijberî hin palewanên nemuslim dikeve şeran. Şah Ebbas, Mesîh Palewan dişêne alîkarîya wî. Huseyn piştî ku payîtexta Hindistanê Hatem Hutanê distêne, vedigere Îsfahanê û derdikeve hizûra Şah Ebbas. Li wê derê bela Huseyn û palewanê serokê Celalîyan li hev dikeve û ew jî li pêşberî Huseyn têk diçe. Êdî piştî vê rûdanê ligel Mesîh Palewanî dibe wezîrê Şah Ebbas.

1.2.2. Varyanta Huseynê Kurd a herêma Diyarbekir-Hezroyê

Vegêrê vê varyantê Remezanê Mamê Boro ye. Sala wiladet û wefata vî vegêrî 1939-2017 e. Memleketê wî Hezroya Dîyarbekir, gundê Kufercinê ye. H. Akyol di sala 1997an da ji devê vegêr qeyd kirîye û di pirtûka bi navê *Huseynê Kurdî* da bi cih kirîye.

Kurteya wê: Bavê Huseyn, Qere Hesên e, navê dêya wî Şahmasta ye. Qere Hesên lawê Mela Mûsa ye; Şahmasta jî keça Şahê Ecem e. Di pey wiladeta Huseyn da bavê wî dimire, dayîka wî, wî dide ber xwendinê. Huseyn dibe evîndarê keça keyayî û ji bo zewaca pê ra, 7 salan ji mala bavê keçikê ra şivantî dike. Huseyn diçe bajarê Mesîh Palewan û li wê derê dest bi şerê dijberî palewanên nemsulim dike. Peyra Huseyn diêe Hindistanê. Ew heft bajaran digire bin destê xwe û keçeke nemuslim a bi navê Garabet ku keça mezinê bajêr e dibîne. Huseyn xizmetkarê xelîfeyê Bexdadê ye, piştî ku digihîje zaferê, dibe xelîfeyê Bexdadê.

1.2.3. Varyanta Huseynê Kurd a herêma Diyarbekir-Bismilê

Vegêrê vê varyantê ne dîyar e; bes em ji jînameya nivîskarê pirtûkê Edîb Polat derdixin ku wî ev metin ji devera Bismila Dîyarbekirê berhev kirîye. Wî ev varyant di sala 2005an da daye çapkirin.

Kurteya Wê: Qemer Hesen bi eslê xwe ji Mala Huseynîyên Şevserê ye. Zemanê ku bavê wî rehmet dike, ew ji bo cawekî wekî kefen ji bavê xwe ra bîne, berê xwe dide Tebrîzê. Di rê da lê dibe şev û li serê çîyayekî dikeve nava çil keleşên rêbir. Ew jî neçar dibe ku derkeve ser rêyan û xelkê bişêlîne. Rojekê gava li ser rêya Xoresanê rê li siwarekî digire, siwar derbeke xedar lê dixê, lêbelê birîna wî jî derman dike û bi dorbenda xwe dipêçe. Qemer Hesen gava tê ser hişê xwe, texmîn dike ku ev siwarê palewan, keçek e. Lewra qesda wê dike, diçe Xoresanê û li pîrejînekê dibe mêvan. Ew derdê xwe jê ra dibêje û pîrejin wesfê wê dide, dibêje ku ew Sîyahpoşa keça Gerdengoş e û nazewice. Qemer Hesen bi alîkarîya vê pîrejinê Sîyahpoşê direvîne têne bajarê xwe Şevserê. Zemanê ku Sîyahpoş tê ser hişê xwe, difilite û vedigere welatê xwe. Li wê derê teklîfa pismamê xwe qebûl dike û daweta xwe dikan. Qemer Hesen careke din, şeva dawetê bi alîkarîya wê pîrejinê Sîyahpoşê direvîne tîne malê. Sîyahpoş dinê Îslamê qebûl dike û ew daweta xwe dikan. Xwedê kurekî dide wan, navê wî datînin Huseyn. Qemer Hesen di heftsaliya zewacê da rehmet dike, Sîyahpoş kurê xwe dide ber xwendinê. Huseyn, heta panzdehsaliyê dixwêne, çav bi keça keyayê Şevserê dikeve û dibe bengî. Dêya wî wê dixwaze. Bavê wê jî bi şertê ku heft salan şivantî bike, keça xwe jê ra erê dike. Piştî sala heftan Huseyn ji bo hazirîya dawetê, hin beranan dibe Tebrîzê. Huseyn li Tebrîzê li ser firotina beranên xwe li qesaban dide û Mesîh Palewan tê wî nas dike. Peyra wî ji bo perwerdeya palewanîyê li cem xwe dihêle. Bi navê Qudusê Xoresanî palewanek tê, bi Mesîh Palewan ra dikeve herbê û wî birîndar dike. Huseyn bêtî M. Palewan diçe wî palewanî dikan û navê vê mêrantîyê bi Mesîh Palewan ve datîne. M. Palewan li ser vexwendina Şah Ebas diçe bajarê wî.

1.2.4. Varyanta Huseynê Kurd a herêma Xerzan (Batman)

Vegêrê vê varyantê Mehemed Mîntaş e, sala wiladeta wî 1957 e. Memleketê wî gundê Qerikê ye ku li ser Hezoya (Kozluk) Batmanê ye. Mamosteyên vî vegêrî, Sofî Miheme û Pîra Besê ye. H. Akyol di sala 2004an da ev varyant berhev kirîye û çap kirîye.

Kurteya wê: Eşîreke Erebi jî şîrîkê rûdanan e. Huseyn ciwanekî êtîm e, dilê wî dikeve keça Padîşêh û wê dixwaze. Padîşah bi şertê ku 7 salan jê ra şivantî bike qatîl dibe. Huseyn qebûl dike û piştî 7 salên şivantîyê, dawa keçikê dike. Padîşah 20 mihî dide wî, nameyekê jî dixê berîka wî û jê dixwaze ku here bajarê Mesîh Palewan, van mihan bifiroşe, nameyê bide Mesîh Palewan, vegere û mesrefa daweta xwe bike. Huseyn gava digihîje bajêr, ew û qesaban şer dikan. Mesîh Palewan pê dihibe tê ku li Huseyn xe, pê derdixe ku mêrekî zerp e, lewra wî dibe

cem xwe. Huseyn nameya padîşahê xwe dide M. Palewan û ew jî dixwêne ku wî tê da nivîsîye ev palewanekî zêde bi qewet e, wî perwerde bike. M. Palewan wî hînî cengê dike. Şevêkê palewanekî kafiran meydana cengê ji Mesîh Palewan dixwaze û ew jî bêyî ku haya Huseynî pê xe, diçe meydanê, Huseyn bi awayê dizî dide ser şopa wî. Wextê ku M. Palewan û palewanê gawir dikevin ber hev, ê kafir M. Palewan bi giranî birîndar dike û davêje erdê ku bikuje, Huseyn digihîjê û nahêle, M. Palewan diêne mala wî. Piştî ku ew sê rojan, şevêkê bi şûrê M. Palewan derdikeve pêşberî palewanê gawir. Huseyn vî palewanê gawir dikuje û dadigere mala Mesîh Palewan û dibêje delêlî derxin bibêjin Mesîh Palewan ew palewanê gawir kuşt. Şêxê Ereban pê dihesê, kêfxweş dibe û Mesîh Palewan vedixwêne zîyafetê. M. Palewan Huseynî li malê dihêle û diçe. Jina wî li pey dek û dolaban digere ku Huseynî ji rê derê. Huseyn terka bajêr dike. Ku Mesîh Palewan vedigere, bi meseleyê serwest dibe, dide pey Huseyn. Huseyn tê li êleke Ereban dibe mêvan. Ji bo ku zikê xwe têr bike, li wê derê di liqunteyekê da dixebitê. Di vê navberê da palewanekî gawir bi tevî eskerê xwe bi ser êla Ereban da digire û xeracê ji wan dixwaze. Êl, hinekî sebir jê dixwazin, her roj liqunteyek xwarin û şerbetê didê û di bin da xeber dişênin pey Mesîh Palewan. Roja ku dora xwarina palewanên gawir ên ku hatine ser şarê êla Ereban tê ser liqunteya Huseyn, ew bi xwe xwarina wan dixê sîtilekê û dibe, di rê da wan dixwe û hestîyan tê da dihêle. Gava ew vê sîtilê datîne ber palewanê qiral, ew hêrs dibe û herbê dixwaze. Ew û Huseyn li hev dixin, Huseyn wî dikuje û eskerên wî êrîşî Huseyn dikin, mêrên Ereban tîr alîkarîya Huseynî û zora eskeran dibin. Piştra Mesîh Palewan jî tê wê derê û M. Palewan mezinatîya êla Ereban dixê destê Huseynî û vedigere. Rojêkê Huseyn rastî palewanekî gawir tê. Ew û wî palewanî dikevin ber hev, dawî Huseyn zor didê û dike ku bikuje, ew dikene, Huseyn şaş dibe, ew pîrektîya xwe nîşan dide û dîyar dike ku navê wê Zengilzêrîn e. Huseyn lê nade, ew jî tê ser dînê Huseynî û tîr nav êla Ereban. Xeber dişêne pey M. Palewan ku bê û daweta Huseyn û Zengilzêrînê bikin.

1.2.5. Varyanta Huseynê Kurd a herêma Semsûrê (Adiyaman)

Vegêrê vê varyantê Şêx Mihemed Erol e. Temenê wî di derdora 50 salîyê da ye. Memleketê wî Semsûr (Adiyaman) e. Mehmet Öncü di sala 2006an da ev varyant berhev kirîye û di pirtûka bi navê *Çîrokên Efsaneyî yên Kurdî* da bi cih kirîye.

Kurteya wê: Huseynê Kurd, ciwanekî qehreman e û şivanê pezê axayekî ye. Ew û keça axayî ji hev hez dikin. Navê keçikê jî Gulistan e. Heft salên şivantîya wî diqedin û Hisên dayîka xwe ji

bo xwestina Gulistanê dişene cem bavê wê. Bavê wê, bi şertê ku 7 salên din jî şivantî bike wê erê dike. Di van rojan da şevêkê Hisên zemanê ku pezê xwe şevîn dike, dikeve xewê û hinek hût pezê Hisên dibin dixin şikeftêkê. Hisên radibe, şopa wan dajo û diçe ser şikeftê. Ew hût jî Hisên mecbûr dikin ku ew ji wan ra şivantî bike. Hisên 7 salan jî li wir şivantî dike, bes rojekê demarên mêrantîyê pê ra çêdibin, hûtan dikuje, pezê xwe diêne. Şahî dikeve nav şênîyên wan û êdî bavê Gulistanê îzna dawetê dide wan. Hisên hin mih dibe bazarê ku bifroşe û pê mesrefa daweta xwe bike. Li bazarê hin qesab lê neheqî dikin, ew li wan dide. Li wî bajarî dengê mezînin dide û Hisên dibêje ku ez berê xwe bidim cem dostê xwe yê Hipiz ku serokê eskerên bajarê xwe ye. Ew gava tê, Hipiz madekirî dibîne, pirsê meseleyê dike, hîn dibe ku çil palewanî bi ser bajarî da girtîye û bac û xeracê dixwazin. Êvarê derengê şevê zemanê ku Hipiz diçe mala xwe, Hisên diçe meydana palewanan. Ferman li wezîfedarên wê derê dike ku ji bo herbê mûman pê xîn, meydana avreşîn kin û li dahola palewanîyê bidin. Ew çil palewanên ku xelkê bajarî bi bac û xeracê girêdane, çûne Çîyayê Xermanê, bi dengê daholan dihesin, tên meydana. Serê ewil palewanê bi navê Hût û yê bi navê Nîvhût tên û xwe hildavêjin ser Husênî, Husên wan dikuje. Piştra ew 38 palewanên din tên, Hisên yeko yeko wan dikuje û tê odeya xwe û radikeve. Serê sibehê Hipiz û xelkê pê dihesin ku Husên ev hikum kirîye, Hipiz hespek, heqîbeke zêr, şûrekî destîsedef û mertalekî dide Husênî. Hisên berê xwe dide gundê xwe. Di rê da mereqa dîtina bajarê Îsfexanê pê ra çêdibe û berê xwe dide wê derê. Gava ew digihîje ber kanîyekê, radikeve, hinek hespê wî didizin, ew jî şopa wî dajo û tê ber şikeftêkê ku kalekî hespa wî li wê derê berdaye û li benda wî ye. Hisên pirsê meseleyê jê dike, ew jî dibêje ku min dît tu palewanekî baş î, min xwest ez te bikêşim vê derê, tecrubeya qeweta te bikim. Kalî destê xwe dide Hisên û dibêje de bişidîne û min ber bi xwe ve bikêşe, Hisên çiqas zor dide xwe, nikare wî ji cihê wî bilebitîne. Îca gava Kalî bi destê wî digire û dişidîne, xwîn di pêçîyên Husên ra davêje. Kalî dibêje here bajarê Esfexanê bigire bin destê xwe. Husên qesda Esfexanê dike, tê dibîne ku mirozê xelkê wê derê ne xweş e. Husên pirsê meseleyê dike, ew jî dibêjin ku Betalê Balûge navdar bi tevî palewan û eskerên xwe ketîye vî bajarî, bac û xeracekê ji paşayî dixwaze. Husên li wê derê dest pê dike di wê firûnê da dixebite ku nan û xwarina eskerê Betalê Balûge amade dike. Rojekê Husên xwarina wan dibe, di rê da xwarina wan dixwe û diçe dikeve xana û ku ew tê da ne. Dibîne ku reqasek ji wan ra direqise û ew jî xemrê dixwin, ji wan Betalîyan ra dibêje va ye min xwarina we anî. Betalek gava devê quşxaneyê vedike, dibîne ku xwarin tune ye, dike ku kulmekê li Hisên dixê, Hisên lê dide wî dikuje. Keleşîyên Betalê Balûge êrîşî wî dikin, lêbelê ew dibînin ku pê nikarin, destê xwe jê ra datînin. Deng diçe paşayê bajêr, tê dibîne ku wa ye Husên ev qaremanî kirîye, jê dipirse bê ka ew kî ye, ew dibêje ku Kurd e û ji bereya Şikakî ye. Paşa dibêje ji nuha şunda bila navê te Huseynê Kurd be, ev bajar jî bila bajarê te be û bibe

paşayê vî bajarî. Huseyn navê xwe qebûl dike, lêbelê paşatîya bajêr qebûl nake û paşa jî qîza xwe ya bi navê Esfexanê lê mar dike. Peyra wî verê dike û Huseynê Kurd vedigere gundê xwe. Seîd Guven (1994) pirtûkeke bi navê Huseynê Kurd, di nav weşanên Lîlav Kitabevi da daye çapkirin. Bi tevî ku li ser malpera Nadir Kitapê wêneyê wê heye jî, nafiroşin.

2. Huseynê Kurd di Edebîyata Safewî û Belûcîyan da


Şeybanî ku eslê wan Ozbek in, ji ber hin sedemên sîyasî û dînî derdikevin dijberî Şah Îsmâîl. Ji ber vê yekê Şah Îsmâîl, li dijberî Şeybanîyan piştevanîya Baburîyan dike û ev rewş heta serdema Tahmasbî jî berdewam dike. Lewra Babûrî li dijberî Ozbekan alîkarîya Safewîyan dibînin. Ku Şah Ebbas dihe ser hikum, nexweşîya navbera Safewî û Ozbekan diwartir dibe. Lewra Şeybanî sîyaseteke wisa dimeşînin ku herêma Xoresanê bigirin bin destê xwe. Ev jî dibe sedem ku Safewî giringî bidin parastina Xoresanê. Ji ber vê di navbera Şeybanî û Safewîyan da dijminahî berdewam dike. Di vê serdemê da, qehremanekî Safewî yê bi navê Huseynê Kurdê Şebisterî derdikeve meydanê. (Johnson, 2004, rr.73-74). Metna vê hîkayeyê ya ku di nav Belûcîyan da heye, Huseynê Kurd, wekî qehremanekî Kurd dihe danasîn û ew wekî pêşîyê Belûcîyan dihe qebûlkin (Boyajian-Surenians, 2007, r.249).

3. Cografyaya ku Ev Hîkaye Lê Belav Bûye

Metin, di edebîyata Belûcîyan da Huseynê Kurdê Şebisterî, wekî yekî Kurd tê pênasekirin û wekî pêşîyê Belûcîyan dihe qebûlkin (Boyajian-Surenians, 2007, r.249). Metna Huseynê Kurdê Şebisterî di edebîyata Îranê da gelek zêde berbelav e. Edîbên edebîyata serdema Safewî ya Îranê, Huseynê Kurdê Şebisterî, wekî qehremanekî Şîî bi nav dikin û ew wî wekî qehremanekî mîna Ahmedê Zemcî ku di Ebûmuslimnameyê da navê wî zaf zêde heye dibînin (Siruri, 1399, r.118).

4. Bajarê Şebisterê û Eşîra Huseynê Kurd

Serlehengê hîkayeyê Huseynê Kurdê Şebisterî, bi eslê xwe Kurdekî ji bajarê Şebisterê ye. Ew di serdema Sefewîyan da jîyaye û di vê serdemê cengawerekî gelek navdar bûye. Wî hemû têkoşîna xwe di rêya edaletê da daye, ji lew ra di kultura devkî ya Farisan da wî cihekî qedirbilind girtiye. Edîbekî Îranî di sala 1840î da serpêhatî û têkoşînên wî, bi awayê romanê nivîsiye. Çawa ku di “Nexşe 1”ê da jî nexşeya bajarê Şebisterê xuya dibe, ev bajar li alîyê jorê bajarê Tebrîzê ye.



Nexşe 2. Di Nexşeya Cografî ya Îranê da Bajarê Şebisterê

5. Analîz û Şiroveya Daneyan

5.1. Îcrakarî di nerîta hîkayevêgêranê da

Vegêran, ew metna pevxistî/îtûbarî (fictitious) a hîkayeyê ye ku xwêner wê dixwêne; guhdar jî lê guhdarî dike yan jî temaşevan lê temaşe dike. Derbirîn bi sê terzan pêk tê: **i.** Derbirîna bi awayê devkî ku di nav kultura devkî da pêk tê, **ii.** Derbirîna bi awayê nivîskî ku di nav kultura nivîskî da pêk tê û **iii.** Derbirîna bi awayê dîmenî ku di nav kultura elektronîk da bi navgînên teknolojîk pêk tê. Di vê rewşê da çawa ku karîgerîya derbirîna kultura devkî li ser vegêrana hîkayeyan çêdibe, karîgerîya derbirîna nivîskî jî, li ser vegêrana nivîskî çêdibe û wan ji nû ve bi teşe dike. Di teşegirtina vê vegêranê da çawa ku karîgerîya kesên vegêr heye, karîgerîya girseya guhdaran jî heye (Çetin, 2016, ss. 1-2). Taybetmendîyên girseya guhdaran, dikare li ser teşe, qeware-hecim û dirêjî-kurtîya vegêranên destanî bandor bike. Kesên vegêr ên hîkayeyên destanî, gava destana xwe li pêşberî girseyeke guhdar derdibirin, dikevin bin bandora daxwaz û bendemayînen koma wan. Lewra gelek caran heman hîkaye, di keşûhewayên cuda da, dibe ku teşeyên cuda yê vegêranê wergire (Çobanoğlu, 2003, r.78-79).

5.2. Tîpolojîya kesê vegêr di metnên hîkayeyî da

Zanyarên edebîyatê ji wan kes û mewcûdên xeyalî ra vegêr dibêjin ku ew wê metna vegêranê ku ji rûdan û honakên rûdanan pêk tê derdibirin. Vegêr, bi giştî ew kes in ku di pêvajoya derbirînê da hin caran şiroveyên xwe dikin, hin caran analîzên ruhî dikin û hin caran jî peyaman didin guhdar yan jî xwênerên xwe. Kesên vegêr gava metnên karakter-epîkî yê mîna destan û

çîrokan bi awayê devkî derdibirin, hin caran nasnameya xwe jî pê ra dîyar dikin. Çinku ew li gor seyra rêzerûdanan tona dengê xwe li gor meyla dilê xwe diguhêrin (Çetin, 2016, r.49). Ev ku heye tîpolojîya wan dîyar dike.

5.3. Perspektîfên vegêranê di metnên hîkayeyî da

Zanayan ji bo kesên vegêr ku gava metneke edebî derdibirin, li gor perspektîfa wan a vegêranê, li gor fokulîsasyon û teyîsîna çavdêrîya wan a derbirînê “riwangeh”³ (perspective) dîyar kirine. Di zimanê Rojavayî ev têgih bi bêjeyên mîna perspektive, point of view, focalisation hatîye binavkirin (Çetin, 2016, r.55). Vegêrên hîkayeyan, yaxud hunermendek gava hêmanên mîna dem, rûdan, cih û lehengên rûdanan ku wekî kadroyên kesan tînan zanîn li pêşberî komekê derdibirin, li gor fikra xwe “perspektîfeke vegêranê” jî hildibijêrin (Aktaş, 1991, r.83).

Ji çavkanîyên tîkildarî mijarê dîyar dibe ku zanyaran çar cure perspektîfên vegêranê rêz kirine: 1. Perspektîfa hakim/îlahî ya vegêranê, 2. Perspektîfa lehengê beşdar a vegêranê, 3. Perspektîfa çavdêr a vegêranê û 4. Perspektîfa tîkel a vegêranê (Çetin, 2016, r.56):

5.3.1. Perspektîfa hakim/îlahî ya vegêranê

Vegêrê derbirînê, di vê vegêranê da bi her tiştekî ku li dinyaya îtîbarîyê ku qewimîye, diqewime yan jî dê biqewime dizane, ew wan dibîne û dibihîze. Heta ew bi tiştên ku di dilê lehengên rûdanan da derbas dibin jî dizanin.

5.3.2. Perspektîfa lehengê beşdar a vegêranê

Vegêr, di vî terzê vegêranê da wekî lehengekî/e rûdanan ku di nav kadroya kesan da cih digire karê vegêranê pêk diene. Ew bi devê kesê yekem “ez/min” rûdanan derdibire. Di vî terzê vegêranê da şewaz, kultur, mîzac, dil û derûnî û mercên civakî yê vegêr li ser binyada derbirînê karîger in.

5.3.3. Perspektîfa çavdêr a vegêranê

Vegêr, di vî terzê vegêranê da jî di nav lehengên hîkayeyê da cih digire; bes ji mesafeyekê ve li kes û rûdanan mêze dike û çavdêrîyên xwe neqil dike. Vegêrên çavdêr, ji derve ve li rûdanan dinîhêrin û mîna kameravanan tevdigerin. Ew bi cîhana hundirîn a lehengan nizanin. Ew di mewqîfeke bilind a hafa rûdanan da dimînin û tenê wan tiştên ku dibînin û dişopînin derdibirin.

³ Ji ber ku di kurdîya naverast-soranî da bêjeya perspektîfê bi tîgîha “riwangeh” hatîye dîyarkirin, li vê derê me jî ev tîgîh tercîh kir; lê wekî tîgîh, îfadeya “perspektîfa vegêranê” jî maqûl xuya dike.

5.3.4. Perspektîfa têkel a vegêranê

Di vî terzê vegêranê da çend tîpên vegêr ên ji hev cuda cih digirin. Yanî kesên vegêr, ne tîpek tenê ye, çend kes bi hev ra ne. Bi gotineke din digel îcrakarê eslî yê vegêranê, vegêrên li gor perspektîfa hakim, vegêrê li gor perspektîfa beşdar û vegêrê li gor perspektîfa çavdêr wekî tîpên vegêranê di vegêrana hîkayeyê da cih digirin. Bi vî awayî, ji yekî zêdetir tîpên vegêran karê derbirînê pêk diênin.

Ji van alîyan ve gava em li vegêrana Huseynê Kurd mêze dikin, em dibînin ku terzê vegêrana wê dikeve bin banê “perspektîfa têkel a vegêranê”. Çinku di nav vegêrên rûdanan da hem serleheng Huseyn heye, hem Mesîh Palewan heye, hem jî vegêrekî ku li derveyî rûdanan dimîne û wekî çavdêrekî rûdanan derdibire heye.

5.2. Binyada motîfên hîkayeya Huseynê Kurd

Bi qasî ku em ji berhema Stith Thompson (1958) a bi navê *Motîf Index of Folk-Literature* têdigihîjin, motîfên ku di hîkayeyên gel da hene ev in (Alptekin, 2011, r.296): Motîfên mîtolojîk, ajal, qedexê, sêhr, mirin, nuwazetî, dêw-hût, azmûn, aqilmend û kêmaqil, xapandin, dîyarkirina dahatîyê, çepzivirîna qederê, siûd û qeder, cemîyet, perûkirin (mikafat) û sizakirin, êsîr û firar, zilmên nenormal, zewac, tebîetê jîyanê, dîn, taybetmendîyên karakterî, mîzah û komên din ên motîfan. Gava em bala xwe didin motîfên ku di hîkayeya Huseynê Kurd da hene, em dibînin ku piranîya van motîfên Thompson tê da cih girtine. Li jêrê em cih didin wan:

5.2.1. Hesp

Hespekî bavê Huseyn Kurd heye, yek jî yê dêya wî heye. Ev her du hesp wisa jêhatî ne ku mîna bayê ne. Herwiha hespên Huseynî bi xwe jî hene.

5.2.2. Mirin

Bavê Huseynê Kurd hîn zarokatîya wî da dimire û Husen êtîm dimîne.

5.2.3. Nuwazetî

Huseynê Kurd zaf zêde dirêj e, qelew e û bi qewet e. Kes pê nikare.

5.2.4. Dêw

Zemanê ku Huseyn zora temamê palewanên mirov ên Îranê dibe, heywanekî wan ê zaf xedar ê herbê heye û ew dertê pêşîya wî. Ew bi zor û zehmetîyeke mezin wê heywanê jî dikuje.

5.2.5. Azmûn

Mesîh Palewan, wextê ku Huseynê Kurd ji bo perwerdekirina palewanîyê dibe cem xwe, wî dixê azmûna karakterîyê. Di pey wî da jina Mesîh Palewan jî wî bi namûsê dixê azmûnê. Wekî din dîsa gelek caran di nav civatan da azmûn derketine pêşîya wî.

5.2.6. Aqilmend û kêmaqilî

Vegêrên hîkayeyê, gelek caran Huseynê Kurd wekî lehengekî kêmaqil nîşan didin. Bi tevî ku çavê kesên dora wî li xapandina wî ye, ew nizane xwe ji wan xelas bike, îlle yek tê wî ji mekran xelas dike.

5.2.7. Xapandin

Di hin rûdanên ku li derdora Huseynê Kurd diqewimin da tê dîtîn ku çavê kesên derdora wî li xapandina wî ye.

5.2.8. Civat

Huseynê Kurd piştî ku digihîje Mesîh Palewan û di herban da bi ser dikeve, êdî ew di nav civata şah û şahzadeyan da cih digire.

5.2.9. Mikafat û ceza

Her cara ku Huseynê Kurd di şerekî da bi ser dikeve, yan Mesîh Palewan, yan jî şahê wê hingê wî perû dike. Jixwe di dawîya hîkayeyê da di hin varyantan da xelk wî dike wezîrê şahî; di hin varyantan da jî ew wî dîkin şahê wî welatî.

5.2.10. Zewac

Huseynê Kurd, ji bo bi keça keyayê bajarê xwe ra bizewice, 7 salan şivantî dike û ji bo kar û barê dawetê diçe bajêr. Di dawîya hin varyantan da piştî ku ew welatê Îranê dixê bin desthilatdarîya Îslamê, daweta xwe dike.

5.2.11. Dîn

Huseynê Kurd bi giştî wekî micahîdekî dînê Îslamê têkoşaye. Wî jîyana xwe gişt xistîye ber xizmeta dînê Îslamê.

5.2.12. Taybetmendîyên karakterî

Vegêrên hîkayeya Huseynê Kurd, bi giştî wî wekî mirovekî saf, safdil, dirust, têkoşer, bixîret û jêhatî nîşan didin. Lêbelê çî heye ku bi tevî van taybetmendîyên wî, ew wî wekî lehengekî nezan, kêmaqil ku zû dixape û çavbirçîyekî ku zû bi zû têr nabe derdibirin.

5.3. Nerîta vegêrana devkî û Şahnameyê li ser vegêrana Huseynê Kurd

Şahnameyên Kurdî bi giştî bi zaravayên cuda cuda hatine derbirîn û ji gotegot, çîrokên mîtolojîk, hemasî û lehengîyê pêk tên. Ev ku hene, nerîta neteweyî, ayînî û civakî ya Kurdan dîyar dîkin. Wekî mecmueyekê ev vegêran, bi piranî ji riwayetên mîtolojîk û destanî yên pehlewani-lehengî û hin caran ji derbirînen evînî yên kultura Kurdan pêk hatine (Vali, 2021, r.23). Bi qasî ku em ji lîteratura têkildarî vê qadê têdigihîjin, Huseynê Kurd, di cîhana Farisan da wekî destaneke dihê naskirin. Hîkayebêjan, mîna Şahnameyê vê jî di qawexaneyan da derbirîye. Qehremanê wê yê eslî Huseynê Kurdê Şebisterî, di serdema Sefewîyan da li Şebisterê jîyaye, li dijberî neyarên Îranê yên mîna Ozbekan ketîye şeran û bi ser ketîye. Rîwayetên vê destanê, li ser bingeha nerîta devkî hatine neqîlkin. Lewra cîyawazî di navbera versiyonên wê da hene. Wisa xuya dibe ku du rîwayetên wê yên orjînal hene. Hîkayeya Huseynê Kurd, wekî hîkayeyeke gel a qehremanîyê xuya dibe. Çinku ji hêmanên lîrîk û evînê zêdetir, xwedî hêmanên epîk e. Hetta mirov dikare modela qehremanîya Şahnameyê jî di vê hîkayeyê da bibîne (Marzolph, 1999, r.279). Cîyawazîya ku di navbera wan da heye ew e ku di qehremanîya lehengên Şahnameyê da motîfên neteweperwerîyê; di qehremanîya Huseynê Kurd da motîfên dînî derketine pêş. Çinku bi giştî kesên neyar û bîyanî, Ozbek in û Sunnî ne; Îranî ku hene, Şîî ne. Ev jî rengvedana mantelîteyî ya civaka Îranê li ser vegêrana vê hîkayeyê nîşan dide.

Vekolerên ku edîsyonên dawî yên Huseynê Kurdê Şebisterî çap kirine, dîyar dîkin ku bêjeya “kord” di zimanê Farisî da tê wateya qehreman û wêrek (Boyajian-Surenians, 2007, r.250). Huseynê Kurd jî mîna karakterên ku di Şahnameyê da hene di rûdanên macerayî da cih digire. Wisa ji mirovan ra tê, mîna ku ew kesên vegêr ên vê hîkayeyê, xwastine ku bi “serkeftin”ên Huseynê Kurd, hin têkçûnên hin karakterên ku di Şahnameyê da cih digirin, telafî bikin. Çinku vegêr, bi vê derbirîna xwe, xwênerên hîkayeyê bi serkeftinên vî karakterî tim kêfxweş dihêlin. Heta ew têkoşîna Huseynê Kurd a li dijberî Zîyayê Hindistanê, gelek dişibe qehremanîya Rustem ku di Şahnameyê da derbas dibe. Çinku ew serpêhatîya Huseynê Kurd ku li Hindistanê ejderhayekî dikuje, serê wî dibire û diêne li ber derîyê mîrê Heyderabadê Mîr Huseynê ku neyarekî wî yê tund e dadileqîne, gelek dişibihe çalakîya Rustem ku wî jî, fîleke spî ya Zalî kuştibû.

5.4. Cureyê edebî yê metna Huseynê Kurd

Vekolerên ku li ser metnên Huseynê Kurdîşah xebitîne, çî yên Faris, çî yên Îngilîz û çî jî vegêrên wê yên Kurmancî bin, navên cihê cihê lê danîne. Hinekan cureyê wê yê edebî wekî çîrok,

hinekan destan û hînekan jî wekî çîroka gel qebûl kirîye. U. Marzolph navê “vegêrana populer”, Rosemary “hîkayeya tolhildanê”, “destan” û “Huseyînnâme”, V. Boyajian-Surenians “epîzota Belûcî” ya vegêranê, A. Yıldız “destan”, E. A. Azizifer, “qisse”, H. Beyat & M. Hayderi & Ş. R. Ferd “destan”, P. T. Azar & Z. Eyvazi “dastan-i ‘amiyane’ û ‘hîkayeya gel’”, M. Ali Ateşşewda “dastan-ı ‘amîyane’”, Z. D. Dihnewi & Y. C. Penderi “qisse”, N. H. Sirûri “destan” û malpera <https://www.ketabrah.ir/%> da jî navê “qisse” lê danîye. Ji ber van cîyawazî û nezelaîyan, li vir me pêdivî dît ku behsa cureyê edebî yê vê berhemê bikin.

Gava em xebat û vekolînên ku li ser cureyên edebî yên edebîyata devkî hatine kirin dixwênin, em dibînin ku pêşî têgiha “destan”ê, peyra têgiha “betalname”yê cih girtîye. Bêjeya destanê, îsmekî Farisî ye, tê wateya hikaye, çîrok û navdarîyê. Herweha bi Frensî, ji destanê re “épope” tê gotin. Wekî din, leqebê bavê Rûstem jî “destan” e. Dîsa ji bo çîrok û navdarîyê jî destan hatîye gotin (Devellioğlu, 2012, r.190). Îca betalname, navê wê hîkayeya gel e ku li dor jîyana efsanewî ya Seyyîd Bettal Gazîyê ku femandarekî Erebi e pêk hatîye. Vegêr, di vê hîkayeyê da rêzerûdanên sedsala 8an ên qehremanî ku di herba Emewî û Bîzansîyan da qewimîne derdibirin. Artêşa Erebi a Emewî, dor li bajarê Stenbolê girtîye da ku wê derê bixe bin destê xwe. Di edebîyata Tirkî da ji metnên van hîkayeyan ra “bettalname” dihê gotin, ev wekî destana ewil a Îslamî ya gelê Tirk dihê qebûlkin (Kaya, 2011, r.4).

Li gor vê pênaseyê em dikarin hîkayeya qehremanî ya Huseynê Kurd, wekî “betilname”yekê bihesibînin. Çinku Huseynê Kurd jî mîna Bettal Gazîyê Erebi, li dijber eskerên nemuslim, berevanîya eskerên muslim dike û hemû rêzerûdanên wî yên qehremanîyê di nav vê çarçoveyê da qewimîne. Îca gava em li geşedan û peresena cureyên edebîyata gel dinihêrin, em dibînin ku bi domana demê ra ji “betalname”yê zêdetir, wekî cureyê edebî, “hîkayeyên gel” derketine pêş. Lewra mimkun e ku em hîkayeya Huseynê Kurd, wekî hîkayeyeke gel a dînî ya qehremanîyê bi nav bikin.

Em ji vekolerên mîna Boratav têdigihîjin (Boratav, 1969, r. 54), zemanê berê, pêşî di nav gel da cureyên edebî yên mîna hîkayeyên destanî, danişmendname û betilname hatine derbirîn. Piştî wan, wekî cureyekî edebîyata devkî, “hîkayeyên gel” jî ketine nav jîyana civakî-çandî ya gel û êdî ji serdemekê bi şûn da, ji hîkayeyên destanî zêdetir, hîkayeyên gel cihê xwe di nav jîyana edebî ya gel da berfireh kirîye. Bi domana demê ra derbirîn û vegêrana van metnên hîkayeyên gel, wekî nerîteke edebîyata gel a devkî, zêdetir bi pêş ketîye. Ji ber ku gel ji “hîkayeyên gel” hez kirîye, hîkayebêj û aşiqan ev cure berhem di civatan da zêdetir derbirîne û êdî wan şûna metnên destanî, xezawatname, menaqibane/wilayetname, û betilnameyan girtîye. Guhdarên piştî sedsala XVI-an, ji hîkayeyên şer û pevçûnên ku li dijberî gelên din hatine kirin zêdetir li

hîkayeyên navxweyî guhdarî kirine. Lewra aşiqan ev metnên ha yên ku pexşan û nezm tevî hev in, li pêşberî koma gel derbirîne û peyra hinekan ji wan, tenbûr jî tevî vê vegêranê kirîye.

Hin zanyarên zanista edebîyatê (Kudret, 1980, r.292) hîkayeyên gel ji hêla mijara wan ve dabeşî “Hîkayeyên gel ên evîndarî” û “Hîkayeyên gel ên qehremanîyê” kirîye. Zanyarekî din ê folklorê E. Saussey yek ji wan e ku hîkayeyên gel ji hêla “esl û çavkanî”yên wan ve polîn dike û dîyar dike ku eslê hin hîkayeyên gel destanî ye, hinek jê li ber destê aşiqên tenbûrê çêbûne û yên din jî Îslamî ne (Sakaoğlu, 2018, r.19). Lewra wan cureyê “Hîkayeyên gel ên Îslamî” li cureyên wê zêde kirine. Hin zanyaran jî ew hikayeyên gel ên ku bi terzê “mesnewî”yan hatine hûnandin, dabeşî cureyên ku mijara wan “dînî” ye, yên ku mijara wan “millî” ye û yên ku mijara wan “evîn” e kirîye (Îlaydın, 1936, r.273). Hîkayeyên evîndarîyê ew cure hîkayeyên gel in ku rûdanên li ser serpêhatîyên evîndaran qewimîne vedibêjin. Evîndar bi piranî nagihîjin hev û din. Ev jî, taybetmendîyên nerîta aşiqîyê bi hemû alîyan nîşan didin. Hikayeya Tahir û Zuhre, Emrahê Ercişî, Arzû û Kanber, Asûman û Zeycan mînakên vî cureyî ne. Hinek ji van hîkayeyên gel hene ku di bawerîya gelan da ji bo rûdanên wan ên evînê bingeheke rastîyê heye. Aşiq wan digel enstrumanan distrên. Hîkayeyên mîna Kerem ve Asli, Aşık Garîp, Emrah ve Selvî Han û Kirmanşah, di vê kategorîyê da cih digirin. Hîkayeyên gel ên qehremanîyê ew cure ne ku li ser derbirîn û vegêrana lehengekî çêdibin. Wekî mînak Şah İsmail, Celalî Bey, Yaralı Mahmut, Hurşîd Bey û Koroğlu, li alîyê Serhedê hene û ji ber ku alîyê wan ê qehremanîyê zêdetir li pêş e, wekî hîkayeyên gel ên qehremanîyê dihên hesibandin. Wekî mînak hîyayeya gel a bi navê “Koroxlî”, çawa ku di nav edebîyata gel a Tirkî ya Tirkîyeyê da heye, di edebîyata Azerbeycan, Turkmenistan, Gurcistan, Kazakistan û Tirkistanê da jî heye. Wekî din di nav civakên neteweyên din ên mîna Gurcî, Ermenî Tacik û Kurdan da jî varyantên wê hene (Boratav, 2012, r.46). Pisporekî edebîyata gel a Kurdî ya Kurmancî (Keskin, 2019, r.195), gava hîkayeyên gel ên Kurdî polîn dikin, metnên mîna Mem û Zîn û Sîyabend û Xecê, wekî “hîkayeyên gel ên evînê”, metna Dewrêşê Evdî wekî “hîkayeya gel a qehremanîyê” û metna Zembilfiroş, wekî “hîkayeya gel a dînî” dihesibînin. Di vê rewşê da “hîkayeyên gel ên Îslamî” bi mijarên xwe ew cure rûdanên dîrokî ne ku li derdora nîrxên Îslamî qewimîne. Ji ber ku vegêran bi giştî li dormedora qehremanîya hin serlehengên dîrokî teşe digire, mirov dikare wan wekî “Hîkayeyên gel ên dînî-qehremanî” bipejirîne. Jixwe hîkayeyên gel ên dînî-qehremanî yên mîna Keleha Xeyberê, Bettal Gazî û Hz. Elî jî li ser vê bingehe ne.

Di vê peywendê da pêdivî çêdibe ku em hinekî dor biînin ser cureyê edebî yê “bettalname”yan jî. Çinku ji alîyê mijar û motîfên dînî ve dirûvê metna Huseyn Kurd dide metna Bettal Gazî jî. Çawa ku pisporekî edebîyata gel a Tirkî (Oğuz, 2007, r.292) jî amaje pê dikin bettalname ew

cure metnên edebî ne ku nûnertîya nerîta epîk dikin. Bettalname wekî metin, di nav destanên mîna Ebû Muslîmê Xoresanî, Seyyîd Bettal Gazî, Melîk Ahmed, Danişmend Gazî û Sarî Saltuk ên serdema Îslamê da cih digirin. Meddahan ev hîkaye ji gelê xwe ra derbirîne. Hinek ji van berheman bi awayê devkî; hinek jî bi awayê nivîskî gihastine îro. Herçendî Huseynê Kurd bi alîyên xwe yên epîk û dînî di dirûvê bettalnameyan da ye, bes ji hêla vegêranê ve bêhtir dişibihe hîkayeyên gel.

Bi tevî ku metna Huseynê Kurd ji her alîyê ve taybetmendiyên cureyî yên “hîkayeya gel” nîşan nede jî, meyla me li ser wê yekê ye ku cureyê wê yê edebî “hîkayeya gel” e. Wekî mînak metnên wê yên ku gihastine ber destê me, varyanta Bismilê ne tê da gişt pexşan in; bes mimkun e vegêrên wê, bi domana demê ra beşên wê yên menzûm ji bîr kiribin. Çinku di varyanta Bismilê da beşên menzûm jî hene.

Di vê rewşê da mimkun e ku em cureyê edebî yê Huseynê Kurd wekî “hîkayeya gel a Îslamî-qehremanî” bihesibînin. Çinkî piranîya bîr û raya vekolerên qadê ew e ku ev hîkayeyeke qehremanîyê ye û dînî ye. Herçendî metnên bi Farisî yên vê hîkayeyê ji têkoşîna ji bo dînê Îslamê zêdetir têkoşîna ji bo mezhebê Şîitîyê derdixin pêş jî, di temamê metnên bi Kurmancî da bi awayekî bêstîsna, têkoşîna Huseynê Kurd tenê û tenê bi zelalî ji bo dînê Îslamê ye.

5.5. Cihê Hîkayeya Huseynê Kurd di edebîyata gel a Kurdî da

Di edebîyata gel a Kurdî-Kurmancî da metnên bi vî rengî kêr in. Herçendî *Qewlê Newala Sîsebanê* û *Qewlê Hespê Reş* ku di vê edebîyatê da du metnên li ser bingeha nerîta devkî ne û mijara wan têkoşîna Îslamî ya li dijberî şervanên nemuslim e, bes serlehengên wan sehabî ne. Lêbelê serlehengê Huseynê Kurd, yekî Kurd e. Ji hêla serdema rûdanê ve jî cîyawazî di navbera wan de heye. Rûdanên ku di van her du metnên navborî da bûne mijar, xasî bi serdema destpêka Îslamê ne, lêbelê rûdanên ku di metna Huseynê Kurd da qewimîne, yên serdema sedsala 17an in. Bi vî awayî em digihîjin wê qenaetê ku wekî cureyekî edebî Huseynê Kurd, hevserdemê *Kela Dimdimê* ye. Çawa ku zanyarên edebîyata gel (Elçin, 1993, r.444) amaje pê dikin, hîkayeyên gel, di nav seyra demê da û li gor belavbûna li cografyayên cuda, bi mehsûlên efsane, çîrok, destan û menqibeyan, berfireh dibin di nav potaya rûdanên dînî, dîrokî û civakî da xwe digihînin gelan. Em van taybetmendîyan bi hêsanî di metna Huseynê Kurd da dibînin.

ENCAM

Metan Huseynê Kurdîşah, çawa ku li cografyaya Îranê berbelav û navdar e, li cem axiverên Kurmancî yên Tirkîyeyê da jî berbelav e. Tevî ku di edebîyata Îranê da bi zimanê Farisî bi awayê nivîskî mewcûd e, li nav Kurdên ku populasyona vê vekolîne bûn, metna vê berhemê bi

Kurmancî, tenê bi awayê devkî heye. Mijara metna Farisî ya nivîskî bi giştî têkoşîna mezhebê Şîitîyê ye; bes mijara metnên devkî yên bi Kurmancî, bi giştî têkoşîna Îslamî ye. Çi di metna Farisî da be çi jî di metnên devkî yên Kurmancî da be, Huseynê Kurd herçendî palewan û betlekî gelek gewre be jî, di vegêranan da alîyên wî yên şivantî, kêmfamî û çavbirçîtîyê zêdetir derketine pêş. Mirov dibêje qey hin ji wan kesên vegêr xwastîye ku mêrxasî û xweşmêrîya wî bixin bin sîya çavbirçîtî, çilekî, nezanî, kêmfamî û dilsafîya wî. Tiştê ku heye mirov piştî xwendina van metnan giştan, dikare wisa li qelem bide ku di dawîya berhemê da Huseynê Kurd yan dibe wezir, yan şah yan jî xelîfe.

Gava em ji hêla motîfên hîkayeyên gel ve lê dinihêrin, em dibînin ku motîfên mîna Xoce Xizirî, ajalên derasayî, qedexe, mirin, nuwazetî, dêw-hût, azmûn, aqilmend û kêmaqili, xapandin, çepzivirîna qederê, cemîyet, perûkirin (mikafat) û sizakirin, zewac, tebîetê jîyanê, dîn û taybetmendîyên karakterî tê da hene.

Di hemû varyantên berhemê da Huseynê Kurd li ber destê Mesîh Palewan perwerdeya eskerî dibîne. Di her rûdaneke bifîkar da Mesîh Palewan dihê hawara Huseynî û wî rizgar dike. Varyantên vê berhemê li cografyaya axiverên Kurmancî ên wê herêma ku tixûbên wê hatin dîyarkirin, di nav Kurmancên Serhed, Semsûr, Dîyarbekir û Batman-Xerzan da mewcûd e. Di nav rêzerûdanên van varyantan da jî cîyawazîyên mîna navên bajar, gel, palewan û malbata Huseynê Kurd derketine pêş; bes di hemû varyantên Kurmancî da şivantî, birçîtî û nezanîya wî heye. Di nav her pênc metnên Kurmancî da ya herî bitertîb, dirêj û tekûz varyanta Qudbedînê Farqînî ye û tenê wî û varyanta Edîb Polat navê bajarê Huseyn, mîna varyantên Farisî, “Şeveser” danîye. Herwiha tenê di varyanta Bismilê da beşên menzûm di nav metna giştî ya pexşan da hene.

Mimkun e ku cureyê wê yê edebî “hîkayeya gel a qehremanî ya dînî” be. Hem alîyên hevpar û dirûvdar ên van metnên Kurmancî di nav xwe da hene, hem jî alîyên hevpar, dirûvdar û cîyawaz di nav varyantên wan ên Farisî da jî hene. Çawa ku ji daneyan dîyar dibe, berhema Huseynê Kurd, ji hêla dîrokê ve rastî serdema şahê Îranê yê Safewîyan Şah Ebbas (1571-1629) dihê. Nexwe mimkun e ku ev berhem di sedsala 17an a mîladî da hatibe hûnandin. Bi vî awayê xwe ev metin, dibe hevdemê *Destana Keleha Dimdimê*. Ev jî cihê wê di nav qonax û serdemên Edebîyata Gel a Kurmancî da dîyar dike.

Ji ber ku hîkayeya Huseynê Kurd, rasterast bi edebîyata devkî ya gel a gelên muslim ên mîna Faris, Belûcî, Ozbek û Kurdan ra heye, mimkun e ku vekolerên “edebîyata berawirdî” jî vê metne bi metnên edebîyata gel ên van gelan ra berawird bikin. Ev jî helbet dê reng û rûyekî nû bide xebatên edebîyata berawirdî yên van gelan.

Ji ber ku berhemên edebîyata gel, hin merhele û qonaxên dîrokî yên gelan ku derbasî metnên nivîskî yên dîrokê nebûne ronahî dike, dibe ku ev metna Huseynê Kurd di vê biwarê da jî bi kêrî “dîroka devkî” bihê. Vekolerên dîrokê ku li ser dîroka devkî ya gelên mîna Sefewî, Erebi, Ozbek, Belûcî û Kurdan dixebitin, dikarin ji metnên vê hîkayeyê sûd wergerin.

Heta niha di xebatên têkildarî Edebîyata Gel a Kurmancî da vekoleran bi awayekî taybet cihekî ciddî nedaye Huseynê Kurd. Lewra hêvî çêdibe ku piştî vê vekolînê ev metn jî di nav vekolîn û xebatên Edebîyata Gel a Kurmancî da cihê xwe bigire.

Eger di pey weşandina vê vekolînê da ev metnên ku behsa wan hat kirin û analîzeke tixûbdarkirî li ser wan hat kirin, bigihîje ber destê vekolerên dunyayê, hêvîdarî çêdibe ku ji nuha bi şûn da zanyar û vekolerên edebîyata gelan, bi çavekî din û perspektîfeke nû li ser vê metnê bixebitin û xwe bigihînin encamên cîyawaz ku bi kêrî Edebîyata Gel a Kurmancî jî bihên. Çinku haya van vekolerên derveyî Kurmancan ku ketine lîteraturê, ji metnên folklorîk ên Kurmancî yên vê berhemê tune.

Ji ber ku qewareya vê xebatê dest nade û hedefa wê jî ne berawirdkirin e, em nikarin bi awayekî berfireh vê hîkayeya gel a edebîyata gel a Kurdî (Kurmancî), ligel hîkayeyeke gel a edebîyata gel a Tirkî yan jî Farisî berawird bikin. Eger siberojê vekolerek vî karî bike, vê berhemê bi berhemeke edebîyata gelekî ra berawird bike, dibe ku di vê mijarê da hin alîyên wê yên din jî zelal bike.

ÇAVKANÎ / KAYNAKÇA

Aktaş, Ş. (1991). *Roman sanatı ve roman incelemesine giriş: Anlatma esasına bağlı itibari metinlerin incelenmesi* (2. bs). Akçağ.

Akyol, H. (2018). *Huseynê Kurdî* (1. bs). J&j.

Alptekin, A. B. (2011). *Halk Hikâyelerinin Motif Yapısı*. Akçağ Yayınları.

- Ateşsewda, M. A. (1384). Ber Ress-i Saxt-i Dastan-ı ‘Amıyane-i Huseyn-i Kurd-i Şebisteri. *Mecelle-i Zeban ü Edebiyat-i Farsi*, (8), 84.
- Azzizifer, E. A. (1398). Cestarî der Tıpşahan-i Şinasî der Farsî ‘Amıyane-ihay Qisse: Mevrid-i Pijühane: Semk-i ‘Eyar, Darabname ü Qısse-i Huseyn Kurd Şebisteri. *Du Mahnae-i Ferheng ve Edebiyat-i ‘Amme*, (25).
- Boyajian-Surenians, V. (2007). A Baluchi Episode From the Huseyn- Kord-e Shabestari Cyle. *Iran & the Caucasus*, 11(2), 249-254.
- Çetin, Y. (2016). *Türk Halk Hikâyelerinde Anlatıcı Tipolojisi*. Kitabevi.
- Çobanoğlu, Ö. (2003). *Türk Dünyası Epik Destan Geleneği*. Akçağ Yayınları.
- Devellioğlu, F. (2012). Osmanlıca-Türkçe Lûgat. İçinde *Osmanlıca-Türkçe Lûgat*. Aydın Kitabevi Yayınları.
- Elçin, Ş. (1993). *Türk Halk Edebiyatına Giriş*. Akçağ Yayınları.
- Johnson, R. S. (2004). The Hyderabad Connection in the Hoseyn-e Kord. *Deccan Studies*, II(2), 73-85.
- Johnson, R. S. (2007). Yuzbashi-yi Kurd Bacheh and ‘Abd al-Mu’min Khan the Uzbek: A Tale of Revenge in the Dastan of Husayn-i Kurd. *Muraqqa’e Sharqi*, 4.
- Kaya, G. (2011). *Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı*. Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans Tezi).
- Keskin, N. (2019). *Folklor ü edebiyata gelêrî* (Çapa yekem). Avesta.
- Kudret, C. (1980). *Örneklerle Edebiyat Bilgileri* (C. 1). İnkılap ve Aka.
- Marzolph, U. (1999). A Treasury Formulaice Narrative: The Persian Popular Romance Hosein-e Kord. *Oral Tradition*, 14(2).
- Oğuz, M. Ö. (2007). *Türk halk edebiyatı el kitabı* (genişletilmiş 5. baskı). Grafiker.

Pertev Naili Boratav. (2012). *Halk Hikâyeleri ve Halk Hikâyeciliği*. Tarih Vakfı.

Saim Sakaoğlu. (2018). *Halk Hikâyeleri*. Anadolu Üniversitesi.

Siruri, N. H. (1399). Zeval-ı Şahsiyet-i Ayyar der Dastan-ı Hüseyin Kürd Şebisteri. *Motun-i Pejuheş-i Edebi*, 22(85). <https://ensani.ir/fa/article/447607/%D8%B2>

Vali, S. (2021). *Şahnameya Kurdî Rustemê Zal û Heft Xana Wî* (1. bs). Avesta.

Çavkanîyên Devkî

Ç1 Qutbedinê Farqînî, 1952-?, gundê Başkoy a Farqînê

Ç2 Remezanê Mamê Boro, 1939-2017, Dîyarbekir, Hazro, gundê Kufercinê

Ç3 Mehemed Mintaş, 1957-?, gundê Qerikê ya Hezoya (Kozluk) Batmanê

Ç4 Şêx Mihemed Erol, 70 salî, Semsûr

Ç6 Heyderê Mûşî, 1934-?, Mûş

Ç7 Perwîz Cîhanî, 1955-?, gundê Belesora Jêrîn, bajarê Xoyê